Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 38
30'ê Apr 2006
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

108'mîn Salvegera Rojnamegeriya Kurdî

Di 22.04.1898'an de bo cara yekemîn Kurd bûn xwediyê Rojnameyê. Yekemîn rojnama Kurdî bi navê **KURDISTAN** hate derxistin. Ev gava girîng û dîrokî ji aliyê rewşenbîrê zana û nemir **Miqdad Midhed Bedirxan** ve hate avêtin..... **R. 2**



"IAEA"ê rapora xwe ya nû da Konseya Ewlekariya NY û da zanîn:

ÎRAN XEBATÊN XWE YÊN ETOMÎ DIVEŞÊRE

Mihemed Elberadeî, Serokê Ajansa Navneteweyî a Vejena Etomî, piştî bi dawîhatina dema diyarîkirî bi Îranê ji bo sekinandina bernamên dewlemendkirina Uraniyûmê, rapora xwe di vê derheqê de pêşkêşî Konseya Ewlekarî ya NY'ê kir û tê de tekezê dike ku Îran guh bi tu xwastên Rêxistina Vejena Etomê ji bo eşkere kirina armancên xwe di vê derheqê de nedaye.

Ji aliyê din jî Serok Komarê Îranê, Mehmûd Ehmedînejad da zanîn ku dewleta wî tu biha û pûteyekê bi biryarnameyên Konseya Ewlekariyê li ser xebatên Etomî yên xwe nade!

Raya giştî ya cîhanê bidestxistina Uraniyûma zengînkirî û çekên Etomî ji aliyê Komara Îslamî bi gef û tirseke mezin bo ser ewlekariya cîhanê dizane. Rayedarên Îranê jî berdewam xebatên xwe yên nepenî û veşartî ên çendîn salî her didomînin. Bê guman rojên berê Konseya Ewlekariya NY dê li ser kiryarên Îranê biryarê bigre û renge ceza ji Îranê re bihê diyarî kirin.

Pîrozbahiya Rêzdar Mistefa Hicrî Bi Boneya Hilbijartina Dubare Ya Birêz Celal Talebanî Bo Serok Komariya Îraqê

Zor birêz cenabê Mam Celal!
Tevî silav û hurmetan

Hilbijartina dubare ya cenabê te ji aliyê Parlemana Îraqê bo Serok Komariya vî welatî cihê keyfxweşiya me û hemû dilsoz û dostên gelê Kurd e.

Bi vê hincetê em germtirîn pîrozbahiyên xwe pêşkêşî te yê rêzdar dikin û hêvîxwazin ku di bin sîbera jêhatî û ezmûnên binirx yên salên xebat û serkirdatiya te de, Îraq ber bi aramî, tenahî û avadaniyê ve biçe û gelên Îraqê jî di bextewerî û biratiyê de bijîn.

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê
Sekreterê Giştî
Mistefa Hicrî
Parîs
23.04.2006
03.02.1385

Mayîn Bikujên Veşartî Û Ne Diyar



Di salê de 20 hezar kes li cîhanê bi sedema teqîna mayînê dibine gorî.... **R. 3**

Demokrasî, Biha û Piratîka Wê Beşa 26

Merca gihîştin bi yekdengiyê hebûna şans û mafê wekhev li beşdarî di diyalog û guftûgoyên civakî de ye..... **R. 4**

Erdhejeke siyasî ya din di Rojhilata Navîdn de

Partiya Hemasê bi serekvtian xwe di hilbijartina Parlemana Filistînê de wekî erdhejekê Rojhilata Navîn hejand.... **R. 5**

Zimanzan û Ferhengkarê Kurd Zana Farqînî di hevpeyvînekê bi Agirî re

Hevpeyvîn di rûpelên 6-9'an de

HIQÛQ Û DADMENDÎ

Tekûzkirin û edilandina rêbazên civakî yên ku bi egera ahengdariya civakê tên amadekirin, wekî dadê tên binavkirin...

R. 10

108'mîn Saliya Rojnamevaniya Kurdî

Di 22.04.1898'an de bo cara yekemîn Kurd bûn xwediyê Rojnameyê. Yekemîn rojnama Kurdî bi navê **KURDISTAN** hate derxistin. Ev gava girîng û dîrokî ji aliyê rewşenbîrê zana û nemir **Miqdad Midhed Bedirxan** ve hate avêtin. Rojnama KURDISTAN li bajarê Qahîreya welatê Misrê, wate li derveyî tixûbên Kurdistanê (Sirgûnê) hate weşandin. Lewra 22'yê Nîsana her salekê wekî salvegera Rojnamegeriya Kurdî bi awayekî berfireh tê pîroz kirin. Di salvegera vê boneya pîroz de neteweya Kurd rêzê ji ked, zehmet û xizmeta ne jibîrkirî ya bavê Rojnamevaniya Kurdî, Miqdad Midhed Bedirxanê mezin digirin. Bi giştî malbata Bedirxaniyan gelek xizmetên berbiçav pêşkêşî neteweya Kurd kirine.

Lê çima yekemîn rojnama Kurdî li nava axa biyaniyan derket û dûr ji welatê xweyî hate derxistin? Dewleta Osmanî ji bilindbûna dengê azadîxwaziya neteweya Kurd û şiyarbûna Kurdan ditirsiya û rê nedida ku rewşenbîrên Kurd bi azadî û serbestî karê weşan û medyayê bikin. Dewleta Osmanî zext ji bo Misrê anî û rojnama KURDISTAN bi neçarî hate qedexe kirin. Piştre KURDISTAN li bajarên Swîsra û Londonê xebatên xwe hetanî hejmara 31'an meşand. Ebdulrehman Bedirxan birayê Miqdad Midhed Bedirxan piştî wî, karê KURDISTANê birêve dibir.



Miqdad Midhed Bedirxanê mezin bo cara yekemîn bi derkirina Rojnama KURDISTAN, Kurd kire xwediyê Rojnameyê

Ji ber bindestbûna neteweya Kurd li her 4 parçeyên Kurdistanê û meşandina siyaseta asîmilasiyon û helandina çand û kultura Kurdî ji aliyê dewletên desthiltdar bi ser Kurdistanê, her ji dema li dayîkbûna yekem rojnama Kurdî hetanî îro Rojnamegeriya Kurdî rastî dijwarî, êş, asteng, qedexebûn û êrîşên cur bi cur hatiye.

Rojname wekî amûreke malbata ragihandinê di sedsala 17'an de derketiye holê û hetanî niha her berdewam e û roj bo rojê nûjentir û pêşketîtir bûye. Bê guman Rojnamegeriya Kurdî kêmasiyên xwe yên taybet hene. Ew jî ji ber vê çendê ye ku tu delîve û derfeteke jêhatî ji bo pêşdebirina çand, ziman, kultur û aliyên din ên nasnameya neteweyî bi Kurdan nehatiye dayîn û kurd ne xwediyê desthilateke xweyî bûne. Nimûna berçav pêşveçûyîna Rojnamegeriya Kurdî di bin siya hikûmeta azad û Federal ya Herêma Kurdistana Îraqê ye ku gelek bidestxistin û pêşketinên mezin û afirandinên baş û hêja hatine kirin. Li Kurdistana Îraqê ya azad de jî Rojnamegeriya Kurdî kêmasî û lawaziyên taybet ên xwe hene . Em hêvîdarin ku bi mifah wergirtin ji delîveya desthilata Kurdî xizmetên zêdetir di vê derheqê de bihêne kirin.

Di 108'mîn salvegera Rojnamevaniya Kurdî de em wekî malbata weşana **Agirî** hêvî dikin ku neteweya Kurd jî li hemû parçeyên Kurdistanê di xurtkirin û pêşketîkirina **hêza çaremîn** ya **demokrasiyê** yanî medya û ragihandin bi hemû amûrên têkildar ên wê bigihîje rojên herî geş û nûjen û Rojnamegeriya Kurdî jî di nava çapemeniyên din yên neteweyên cîhanê reng û dengê xwe hebe.

Semînara Derbeyek Di Bin Navê Şoreşa Çandî De

Mihemed Cemîl Kulahî

Seet 15'ê piştînîvroya roja şemî 2'ê Banemera 1385(22.04.2006)'an, semînara **Derbeyek di bin navê Şoreşa Çandî de** ji aliyê Yekîtiya Xwendekarên Demokrat a Kurdistana Îranê bi hilkevta salroja kudetaya çandî, ku bû sebebê daxistina zanîngehên Îranê hetanî midehê 3 salan, hate lidarxistin.

Di vê semînarê de bingehên hizrî û bandora wê derbeyê li ser bizava xwendekarî û her wiha civaka Îranê bi giştî bal hate kişandin.

Hejmarek ji xwendekarên zanîngeha Silêmanî, Koyê, Hewlêrê û her wisa çend kes ji Mamostayên zanîngehan di vê semînarê de pişikdar bûn.

Seretaya semînarê bi sirûda neteweyî a **Ey Reqîb** û deqeyek bêdengî bo canê paqij yê şehîdên rêya azadiya Kurdistanê hate dest pêkirin. Piştî vê kekê **Erfan Rehnimûn**, endamê Desteya Damezirandina YXDK Îranê bo bixêr hatin kirin ji mêvanan û vekirina semînarê çend gotinek pêşkêş kir. Pişter kekê Kerîm Perwîzî, Sekreterê YXDK Îranê gotarek li jêr navê **bingehên fikrî yên derbeya çandî a 59'an** pêşkêş kir ku di wê gotarê de qala çawaniya pêkanîna navend (stad)a Şoreşa Çandî kir û bal kişande ser çelengî û kar û xebatên vê navendê ku navhatî bûn ji:

1. Perwerdekirina mamostayan û wergirtina kesên jêhatî û hêjayê ders(wane) gotinê di zanîngehê de li gorî ramanên desthilata Îslamî ya Îranê.
2. Wergirtina xwendekarên ku li gorî pîvanên rejîmê tên hilbijartin.
3. Îslamîkirina rewş û atmosfera zanîngehê û guhertinên bernameyên bîr û fikrî yên zanîngehê.

Di doma semînarê de gotara **Bandorên Şoreşa Çandî li ser tevgera xwendekarî ya Îranê** ji aliyê Mihemed Cemîl Kulahî, endamê YXDK Îranê hate pêşkêş kirin ku tê de îşare bi çend encaman ku di derbeya çandî de derketin holê kir.

Piştre kekê Hejar Rehîmî endamê Desteya Rêveber ya YXDK Îranê gotara **Şoreşa Çandî îşareyek bo selefiyeta nûjen** xwend.

Di beşeke din ji karê semînarê de gotara **Şoreşa Çandî û jînosayda çandî di Kurdistanê de** ji aliyê kekê Rambud Lutfpûrî endamê Desteya Rêveber ya YXDK Îranê hate pêşkeşkirin. Wî di gotara xwe de qala wan guhertinên hizrî û civakî kir ku bûne sebebê serkeftina wê şoreşê.

Li pey bêhnvedaneke kurt de panêleke pirs û bersivan li ser gotaran pêk hat ku beşdarên semînarê bi çelengî tê de beşdarî kirin.

Semînar seet 18:30'ê êvar bi dawî hat.

Têdîtin: Deqa gotarên vê semînarê di malpera taybet ya Agirî de tên belav kirin

www.arsivakurd.org

Mayîn Bikujên Veşartî Û Ne Diyar

Azad Kurdî

Di salê de 20 hezar kes li cîhanê bi sedema teqîna mayînê dibine gorî.

Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, roja 4’ê Avrîlê, wekî Roja Cîhanî ya Xebat Dijî Mayînên Bin Erd li nav kiriye. Armanc ji diyarîkirina vê rojê ji aliyekê pêşkevtinên di warê paqijkirin û ji holê rakirina mayînan û ji aliyeke din jî tirsa mayînên bicih mayî di welatên cîhanê de bide xuya kirin.

Diyarîkirina rojekê di salê de wek Roja Cîhanî ya Xebat Dijî Mayînan, di zêdetir ji 80 welatên cîhanê de, ji aliyê Neteweyên Yekbûyî, giringiyek xasmanî heye û vê rastiyê jî ji me re diselimîne ku tevî bi dawî hatina şer li piraniya welatan, hêşta mayînên çandî û telikên teqînê, gef û tirseke mezin bo ser jiyana xelkê wan welatane ne.

Peymana herî mezin ya navneteweyî li dor qedexekirina berhemanînê, enbarkirin, veşartin, bikaranîn û firotina mayînên dijî kesî û ji nav birina wan, bi peymana **Otawa** bi nav û deng e ku di sala 1997’an de, li welatê Kunadayê hate lidarxistin û Rêxistina Neteweyên Yekbûyî weke konvansiyoneke navneteweyî ji bo qedexekirin û ne bikaranîna mayînan pesend kir.

Karnameya Komara Îslamî ya Îranê derheq nehêlana mayînan

Îran piştî welatê Mîsrê, duyemîn welatê cîhanê di warê hebûna herî zêde ya qasê mayînên ne teqandî tê hesibandin. Li gor rapora Wezareta Hundir ya Komara Îslamî a Îranê, di sala borî de 76 milyon mayînên ne teqiyayî li Rojavayê Îranê bicih mane. Piraniya mayîn û madeyên teqînê di Îranê de, di navbera tixûbên Bakûra Rojava, Rojava û Başûrê Rojavayê Îranê hilketine. Tixûb yan hidûdek ku her 4 parêzgehên Kurdakincî û çend bajarên Erebakincî yên Başûra Rojavayê Îranê bi xwe ve digire. Mayîn û telikên teqînê ku di çaxê şerê 8 salî yê Îran û Îraqê de hatine bi kar anîn, hetanî niha ne hatine paqij kirin. Li gorî rapora Wezareta Hundir ya Komara Îslamî a Îranê, pitir ji 3 milyon hektar ji erdên bajarên sînor ên Rojavaya Îranê mayîn hatine çandin.

Serbarê pejirandina biryarnameya 598’an ya Neteweyên Yekbûyî û dawî pê hatina şer di navbera Îran û Îraqê de, li sala 1988’an, beşeke berfireh ji deverên mayînrêjkirî hêşta nehatine paqij kirin. Heta sala 1997’an, tenê 50 hezar hekter ji herêmên mayînrêjkirî hatine paqij kirin. Di van 8 salên dawiyê de jî, me xebat û projekteke wisan ji berpirsiyarên rejîmê bo ji holê rakirina mayînan di Îranê de nedîtiye. Eva di halekê de ye û her wekî berê jî hate bas kirin, pêtirî 3 milyon hektar erd û axa mayînrêjkirî di Îranê de heye. Pêvajoya paqijkirina mayînan dide xuya kirin ku Komara Îslamî ya Îranê bûdce û îmkaneke gelek kêm ya malî û mirovî û wd ji bo vê armancê terxan kiriye.

Hemû tixûbên Kurdistana Îranê mayînrêjkirî ne

Bi sedema hilkevta warê demografî ya Kurdistana Îranê li ser xalên sînor yên Rojavayê Îranê, roj nine ku em di deng û basan de nebihîstin ku di yek ji bajarên Kurdistana Îranê de, kesek yan çend kes bi sebebê teqîna mayînan jiyana xwe ji dest nede, yan endamek yan çend par ji laşê xwe ji dest nedin.

Kurdistan herêmeke paşdemayî û bêpar di nava welateke paşverû de ye. Civatên xelkê Kurdistanê bi sedema bêkarî, jarî, destkurtî û nebûnê, bi armanca peydakirina debara malbatên xwe, neçar in her gav seredan û hatin û çûna tixûban bikin û bi barbirin û kasibkariyê jiyana xwe ya dijwar bimeşînin. Lê hemû rojê nûçeyê girtin, dest girtin bi ser alavên wan, kuştin, siqetbûn û wd negihîje guhê me. Ji vê çendê nexweştir eva ye, em dibînin hinek ji kasibkarên zehmetkêş yên Kurd, seba teqe lêkirina hêzên rejîmê li bajar û gundên sînor jiyana xwe bext dikin.



Mayîn xetereke mezin ji bo jiyana zarokan

Parêzgehên Îlam, Kirmaşan, Azerbaycana Rojava, Kurdistan û Xozistanê qasê herî zêde ya mayînên ne teqiyayî hene ku ji van 5 parêzgehane, 4 parêzgeh Kurdakincî ne. Em dikarin bibêjin tixûbê her çar parêzgehên ku Kurdistana Îranê pêk tînin, mayînrêjkirî ne. Gelê Kurd li bajarên Şino, Pîranşar, Dîvandere, Serdeşt, Ormiye, Pave, Nexede, Bane, Merîvan û tev bajarên parêzgehên Kirmaşan û Îlam tevî xetera tirsdar ya mayînan berbirû ne.

Di vê navberê de parêzgeha Îlamê, rûbera herî zaf ya herêmên mayîn çandî yên Îranê pêk tînin. Îlamê 430 kîlometr tixûbê hevbeş bi Îraqê re heye û bi gotina berpirsyarên rejîmê pitir ji yek milyon û heft sed hektar, herêma mayîn çandî li xwe girtiye. Piştî şer tenê di bajarê Îlamê de 800 kes bi sedema teqîna mayînê hatine kuştin û 1300 kes jî birîndar û nivîşkan bûne. Li gorî gotina Parêzgarê Îlamê, piştî hilweşîna rejîma Bees li Îraqê heta niha di parêzgeha Îlamê de 300 kes hatine kuştin û bi dehan kes jî birîndar bûne. Herwiha bajarên Şino, Pîranşar û Serdeştê jî, hejmarek zaf goriyên teqîna mayînan di salê de hene. Li gorî gotina Rojnamevanê Kurd, Xusro Kurdpûr ji Bokanê, bi awayekî giştî di her rojekê de li seranserê Rojavaya Îranê, nêzîk bi 22 kes seba teqîna mayîn û telikên teqînan birîndar dibin û hinek ji wan jî tên kuştin.

Teqîna mayîn û teqemeniyên din, ji bo rûniştiyên bajar û gundên Kurdistana Îranê wekî tişteke edetî û normal jê hatiye. Serbarê vê rastiyê ku rejîmê tu giringiyek ji bo bajarên Kurdistanî yên Îranê di warên siyasî, aborî, civakî, çandî û wd ... de nedayiye, lê amade ye bi milyon Dolaran sermayê ji bo alîkarî û piştevanî ji hêzên tundrew û terorîst û maytêkirin di kar û barên hundir yê welatên din biserfîne. Di halekê de em dibînin ku di bajarên Kurdistana Îranê de rojane bi dehan kes bi sedema teqîna mayînan, diyariya şerê kêmaniya radîkal ya Xumeynî û karbidestên din yên Komara Îslamî tên kuştin û birîndar dibin, lê rejîmê tu balek bi vê pirsgirêkê nedaye û ne hazir e ku di xebateke bilez de mayînan paqij bike û xelkê Kurdistanê jî çi din nebin goriyê mayînan. Ji hemûyan ecêbtir eva ye ku berpirsiyarek Wezareta Parastina rejîma Komara Îslamî, vê dawiyê da zanîn ku renge xebata ji nav birinê û paqijkirina herêmên mayînrêjkirî yên Rojava yên Îranê 5 deh salan demê bixwaze yanî hetanî 50 salên din em divêt kuştin, birîndar bûn û nivîşkanbûna xelkê sivîl û zehmetkêş bibin.

Niha di hinek welatan de ku mayîn tê de hene, bi alîkarî û piştgiriya rêxistinên navneteweyî, pêşketineke xuya di warê paqijkirina meydanên mayînan, bidestve hatiye. Em dikarin qala welateke wekî Efxanistanê bikin ku çendîn salan tûşî şer bibû û heyemek e bi alîkariya rêxistinên navneteweyî, pareke zaf ji herêmên mayîn çandî, paqij kiriye.

Heta em li benda gav û xebatên Komara Îslamî ya Îranê ji bo hilgirtin û ji nav birina mayînan bin, hemû rojekê em dê şahîdê kuştin, birîndarbûn û kêm endambûna xelkê Îranê û di vê navberê de pitir ji tevan Kurdan bibin. Lewra hewce ye daxwaza hevkarî û piştgiriyê ji rêxistinên navneteweyî û NGO’ê mirovhez ji bo beşdariya çeleng û aktîv ya wan di vî warî de û çêkirina welateke bêmayîn û madeyên teqemeniyê bihê kirin.

Heke kasibkar, barber, cotkar, pezdar, xelkê sivîl û wd... ji ber hebûna mayînan û madeyên teqînê tirs û nigeranî hene û jiyan û kar û xebata wan tevî tirs û xeterê barbirû kiriye, neheq ninin. Heke xelk mayînan bikujên veşartî û nepenî li nav dike, evane û gelek egerên din vê yekê ji bo me re diselimîne ku divêt agehdar û hişyarê vê xetera mezin û bê çareserî ji aliyê Komara Îslamî ya Îranê bibin û pitir gavên micid û erênî bo bavêjin.

Demokrasî, Biha û Piratîka Wê

(Beşa 26)

Kurmanc Hakkî
kurmanchakki@yahoo.com

Di hejmara berê de *wekhevî û pakî* û her wisa *erkê dadperweriyê* li demokrasiya delîberatîv de li gor teoriyên "Rawls" hatin şirovekirin. Hate gotin ku di civaka rêxistî de konfilîktên civakî û exlaqî li rêya gotûbêj û gengeşeyên vekirî ku tê de hemû endam û aliyên civakê beşdar dibin, tên çareser kirin. Di demokrasiya delîberatîv de gotûbêjên eşkere dibin hegera pêkhatina yekdengiya nisbî ya welatiyan li ser pirsgirêkên pêwendîdar bi civakê û biryardanê. Merca gihîştin bi yekdengiyê hebûna şans û mafê wekhev li beşdarî di diyalog û guftûgoyên civakî de ye, yên ku di çarçoveya normên diyarîkirî de cî bi cî dibin. Di vê hejmarê de em doma mijara xwe şirove dikin:

Mafên demokratîk di demokrasiya delîberatîv a kevin û modern de

Di demokrasiya delîberatîv de ev mafên ku li gor teoriya "Dahl" de cih nakin, tên naskirin. Li gor "Dahl" (1989) bingehê mafan li ser esasê neçariya wan tê hesibandin. Ew bi xwe jî li ser vê bawerê bû ku hin maf hene ku bi awayên demokratîk tên berevanî kirin û hin jî hene nahên berevanî kirin. Ew mafên ku bi awayê demokratîk tên şirove kirin, bi ***demokrasiya antîk*** yan ***demokrasiya kevin*** tê nas kirin û yên din jî bi **demokrasiya *modern***. Nivîskarê Fransî "Benjamin Constant" (1819) ew pênaseye dabeş kiriye. Li gor "Lagerspetz" (1998) demokrasiya antîk mafên giştî yê welatiyan diparêze û demokrasiya modern mafên takekesiyê diparêze. Bingehê demokrasiya antîk li ser têgihîştina kilasîk ji demokrasiyê ye. Her wisa komarxwaz piştgiriyê ji demokrasiya nûjen dikin. Mafên demokrasiya antîk di rastî de mafê beşdarî kirin li van pirsên ku pêwendî bi biryarên giştî re hene, tê pênase kirin. Mafên demokrasiya nûjen ji bilî mafên jor qala wan hate kirin, mafê xwedîtî, mafê parastina kesayetiya takekes û her wisa mafê serbestiya hilbijartin yan nehilbijartina dîn û ol ji xwe digire.

Li gor baweriya "Dahl" demokrasiya bikar dikare li hember pirsa milkiyeta taybetî[1] jî biryarê bide. Ew dipirse çima biryara li ser bingeha piraniya deng nikare dest li milkiyeta taybtî wer bide? Li gor demorkrasiya prosêdûralîzmê, biryarên han dikarin ji rêya metodên normal bên cî bi cî kirin.

Teoriya "Proseurale Dahl" mafên welatiyan bi awayekî berfireh wek têgihîştina Lîberalîstan li demokrasiyê di xwe de cih nade. Li gor lîberalîstan mafê takekes û berfirehbûna wê merca proseyên demokrasiyê ye. Bi vî awayî mafê takekes nabe girêdayî bi biryarên giştî be. Li gor lîberalîstên destûrî (constitutionalist) mafên takekesî divêt li destûr û yasaya bingehîn a welatan bê parastin.

Demokrasiya delîberatîv dikare ji bo çareserkirina dijberiya lîberalîzm û demokrasiyê derbarê mafên bingehîn dijberiyên nû nîşan bide. Mafê bingehîn di demokrasiya delîberatîv da li ser wê hatiye damezrandin ku bingehên biryaran divêt bi awayekê be ku aliyên civakê bi awayekî dadperwerane bikarin pêk bihên. Bo mînak "Joshua Cohen" (1997, 1998) pirsa hilbijartina ayîn û wijdanê ku dikarin bi mafên demokratîk yên nûjen li nav bikin, şirove dike. Li gor wî qedexekirina mafê serbestiya ayîn dibe hegera vê yekê ku giştgirbûna biryara demokrasiya delîberatîv bikeve bin pirsê. Eger bihê û alîgirên tundrew yên ayînekê di hilbijartinan de serkevin û bixwazin serbestiya ayînî yan mafên kêmaniyan sinûrdar bikin, girûpa han divêt bi xwe jî amade be ku serbestiyên xwe ji dest bide. Eva karek gelek zehmet e û ji ber wê jî sinûrdarkirina hizr û serbestiya ayînî di demokrasiya delîberatîv de nahê pejirandin.

Di şûna sinûrdarkirina mafê serbestiya ayînî û wijdanî demokrasiya delîberatîv hin normên din pêşniyar dike, yên ku li gor şiroveya "Dahl" nahên qebûl kirin. Ji bilî vê yekê, demokrasiya delîberatîv demokrasiya antîk berfireh dike û ew mafên ku "Dahl" qala wan dike wek bingehê hewce yê demokrasiyê bihêztir dike.

Encama raya giştî

Hebûna diyaloga giştî û vekirî dê bi sê curan bikare kar bike ser prêfirênsa welatiyan. Li berî her tiştekê diyaloga vekirî dibe hegerê vê yekê ku dîtina mirov li ser pirsgirêkan berfirehtir dibe û dibe hegera vê yekê ku aliyên çewt ên pirsgirêkan cem welatiyan bihê şirovekirin û bi vî awayî welatî xwe li biryarên şaş diparêzin. Ya dudûyan eva ye ku bi diyaloga vekirî û eşkere hebûna argûmentên cur bi cur dibe hegera wê yekê ku welatî bikarin ew dîtinên dijhev li hev cuda bikin û xwe li hilbijartina dijayetiyê biparêzin. Taybetmendiya sêyem eva ye ku bi hebûna diyaloga vekirî ku dibe hegera wê yekê berjewendiyên takekesan bi awayekê bihên kom kirin ku bikarin hemberî dîbatên civakê raweste. Rewşa han dibe hegera wê yekê ku beşdarên diyalogê rewşa mirovên din jî berçav bigirin û berjewendî û rewşa xwe li gor berjewendî û rewşa derdora xwe berçav bikin. Taybetmendiya sêyem çewaniya kar tê kirina diyaloga vekirî li ser mirov bi awayekî berfireh nîşan dide û dibe hegera wê yekê ku mirov di her bas û dîbatekê de dadperwerî û giştgîriya mijaran berçav bigire.

Îdeala diyaloga vekirî a demokrasiya delîberatîv bi destveanîna hevhizrî ya giştî ye. Di jiyana rastî de îmkana wê yekê nine ku bihêztirîn argûmênta civakî jî bikare hevdengiyê di nava civakê de pêk bîne û dengê %100 bi dest bixe. Di basa demokrasiya delîberatîv de bi vî awayî bikaranîna hevdengiyê yan yekdengiyê xizmeta wê hizrê nake û hizra demokrasiyê li rastiya jiyanê dûr dixe.

Ger bihê û di diyaloga giştî de hevdengî pêk neyê, ji bo biryardanê hewceyî bi dengdananê ye. Pirsgirêk wê demê eva ye ku dengdan û diyaloga giştî giraniyê didin aliyên cuda bo pêkanîna konsênsûsa civakî û dadperweriyê. Di dengdanê de bi awayê fermî prêfirêns û raya giştî bi şêweyên bê alî û "neutral" tên nirxandin. Di demekê de îdeala diyaloga giştî pêkanîna nirx û bihayên hevbeş di navbera endamên civakê de û gihîştin bi hizra hevbeş e.

Dengdan bi tenê nikare alîkariya mirov ji bo bidestveanîna yekdengiyê bike. Ji ber ku gelek caran bi hegera nihêrînên cur bi cur, belkî bidestveanîna piraniya dengan ne mumkin be. Mirov dikare bipirse gelo ji bilî dengdanê diyaloga giştî dê çawa bikare li peyda kirina hevdengiyê alîkariya civakê bike. Li dor vê çendê lêkolînên nû dest pê kirine. Ji bo şirovekirina wê yekê bikaranîna mînakekê dê karê me hêsantir bike:

Em wilo bihesbînin ku dartiraşeke/a xanenişîn yê/a Urmiyeyî, Genceke/a alîgirê jîngehê yê/a Sineyî û Milyonereke/a Kirmaşanî dixwazin bi awayekî delîberatîv li ser pirsgirêka vejenê[1] biryarê bidin. Di mînaka me de ew dixwazin Nefta (petrola) Kirmaşanê bi awayekî "desentral"[1] û erzan berhem bînin. Her sê sozdar bi rêzgirtin li normên demokrasiya delîberatîv in û dixwazin biryara ser berhemanîna neftê li gor diyalogên giştî û bi awayekî vekirî bihê dan.

Em wilo dabinên ku ev sê kese li gor teoriya "Rawls" xwediyê têgihîştin û sozdar bi exlaqê giştî yê civakî ne ku berprisyariya wan di civakê de şirove dike û ew erkê xwe derheq bi civak û jîngehê dizanin. Em wilo danên ku Dartiraşê/a Urmiyeyî komonîst e. Gencê/a Sineyî jî piştgiriya ekofêmînîzmê dike û milyonerê/a Kirmaşanî jî alîgiriya bazara azad dike. Di rewşeke wiha de mirov dikare wiha bibîne ku ew bi awayekî giştî hemû dijî hev in û pêkhatin û gihîştin bi hevdengiyê gelek zehmet tê berçav. An jî li gor "Rawls" dijheviya exlaqî pêk hatiye. Bi vê wateyê ku destpêka danîna siyasetan bo vejenê bi dijheviya exlaqî, nirx û bihayên takekesî dest pê dibin.

"List" (2002) pêşniyara rêzkirina altirnatîvan li gor girîngiya

www.arsivakurd.org

wana ji bo çareseriya giriftên çend altirnatîvî kiriye. Li gor wî ne hewceye di her tiştî de hevdengî pêk bihê. Li gor wî mirov dikare bi awayekî lojîk pirsgirêkan bi awayê girîngiya wan rêz bike. Bo nimûne bo gihîştin bi hevbîriya hevbeş sê kesên mînakê dikarin li ser berjewendî û qenciya berhemanîna berbilav ya vejenê bigihîjin hevbîriyê. Bo nimûne kesê/a Urmiyeyî dikare wê yekê di xizmeta pêşvebirina wekhevî û yeksaniya civakî de bibîne. Gencê/a Sineyî dikare li ber belavbûna berhemanînê de aliyê ekolojî û jîngehîn bibîne û dewlemendê/a Kirmaşanî jî dikare hizra wê bike ku bûna berhemanîna berbilav dikare xizmeta pêşveçûna aborî bike. Ew gîremîna “List” zortir wek lihevketinê diçe nek berhema diyaloga vekirî ya civakî ye.

Bo demokrasiya delîberatîv girîng e ku rewşên pêşhatî bi awayekê bikevin ber rojevê ku di dawiyê de piştî diyaloga giştî bikarin alîkariya biryardanê li ser dengê piraniyê bikin. Hegera wê heye ku di diyalogên giştî de mijarek bikare prêfirênsa herî bilind bi destve bîne. Bi wê wateyê ku di dengdanê de altirnatîva han dengê herî zor bi dest bîne. Di rewşeke wilo da hewce bi hevdengî di buha û nirxan de nake. Belkî girîng e ku lihevhatin û hevdengî di nehêlana dijayetiyê de hewce bi yekdengiyê yan piraniya dengan dike.

Li mînaka jor hatî de hate bas kirin ku mirov dikare bo nimûne bêje ku berçav girtina ekolojiyê di berhemanîna vejenê de dikare dijî pêşveçûna aborî rawestaye. Di rewşeke wilo da biha û nirxên argûmênt û altirnatîvan dikevin dijî hev. Lewma dengdan dibe hegera wê yekê ku di hilbijartina navbera wan du altirnatîvane de bilindiya prêfirênsan bê bidestveanîn.

Mînaka serê zehmet bûna wê yekê nîşan dide ku çawa mirov dikare di navbera 3 altirnatîvên dijî hev de bigihîje encamê. Lewre bo lihevhatin li ser bingeheke demokratîk divêt hinek li mafên xwe bibihorin bin. Pirsyara tê pêş eva ye ku erê gelo diyaloga vekirî dikare yekdengiyê ser nirx û buhayan pêk bîne? Di teoriya “Rousseau” de pêşîneya nirx û buhayên hevbeş bingeha hevdengiya welatiyan tê dîtin. Xasmayî popolîst, êpîstemîst (alîgirên rastiyan) ser vê baweriyê ne ku diyaloga giştî dikare bibe hegera pêkhatina yekdengiyê li ser nirx û bihayên civakî.

Pirsa dadperweriya “Rawls” hin sinûran jî ji bo diyaloga giştî û pêkanîna hizra hevbeş didane. Ji wan em dikarin qedexekirina propagende ji bo rasîzm û nejadperestiyê nav bibin. Belkî ew sê kesên mînakê de hatî bas kirin bi zehmet bikarin bigihîjin yekdengiyê, her çend belkî bi awayekî delîbratîv hin lihevhatin navbera wana de çê bibe. Pêşveçûna aborî ger xizmeta wekheviya civakî û harmoniya jîngehê bike, dê bikare li gor hemû kirîtîkên demokrasiya delîberatîv bibe cihê pesenda giştî.

Diyaloga vekirî dikare bi awayekî din xizmeta hizr, raman û nirx û bihayên hevbeş bike. Di encama hatine pêşa bas û argûmêntan de welatî dikarin bi awayekî berfirehtir pirsgirêkên pêwendîdar bi jiyan û çarenivîsa xwe û di dema biryarên kolektîv de rêzbendiya biha û nirxan bikin. Di rewşeke wilo de bo nimûne her sê mînakên jor girîngiya herî mezin bi pirsa ekolojî bidin. Ji ber ku ew pirse dikare bo pêşveçûna aborî û wekheviya civakî wek bingeheke bihêz bihê dîtin.

Hevdengî li kirîtîkên berhevdanê ne merc e, hevdengî di biryardanê de pêk bîne. Her çend her sê aliyên pirsa jor li ser rêzbenda girîngiya basan pêk bihên, belkî nikarin li ser pirsa berhemanîna neftê bi hêsanî lihev bikin. Cudabîrî û hizrên dijî hev li nirx û bihayan û rêzkirina girîngiya pirsên ber biryarê gelek caran gihîştin bi armancê zehmet dike.

Doma mijarê di hejmara tê de.

Erdhejeke Siyasî ya Din Di Rojhilata Navîn De

Meryem Hacîpûr

Di encama serkeftina çavnihêr nekirî ya Hemasê di hilbijartina Parlemanî a Felestînê de, erdhejeke siyasî a din Rojhilata Navîn hejand û girûpa Îslamî a tundrew a Hemasê berevajî hemû nêrîn û pêşdîtinan, karî piraniya herî zor a kursiyên Parlemanê bi dest bixe. Ji kesê re veşartî nine ku ev girûpa terorîstî bi ancamdana dehan kiryarên terorîstî naverok û kakila xwe ya bi dijî Îsraîlê eşkere kiriye û tu demekê Îsraîl bi fermî nas nekiriye.

Partiya Hemasê ji bo fermî nasîna Îsraîlê jî astengên zaf li ser rê hene. Yek ji wan astengane Rêxistina “Feth” e. “Feth” zêdetir ji deh sala ye ku lome û rexneyên tund û hiloşîner yên Hemasê di warê bi fermî nasîna Îsraîlê de dibihîse û berxwedaniyê dike û niha jî iznê nade ku Hemas bê dana tu nirx û bihayekê û bê pirsgirêk dest bi karekê bide ku li mêj sal e ew bi nîşaneya xiyaneta rikberên xwe zaniye. Pirsgirêka din ya Hemasê, saziya “Cehada Îslamî” ye. Tê gotin ku partiya han di berdewambûn û pêçeqandin li ser helwestên radîkal yên xwe li hemberî Îsraîlê de cehdê dike ku bi rakişandina alîgirên Hemasê bo aliyê xwe, xwe weke aliyeke bihêz li hemberî Hemasê de nîşan bide.

Her wiha renge dijberiya serokên Hemasê yên di sirgûnê de weke Xalid Meşel û Ebo Mûsa El Merzûq tevî fermî nasîna Îsraîlê, pirsgirêkek din ya li ser rêya Hemasê ji bo bi fermî nasîna dewleta Cihûyan be.

Ew du kesane di Sûriyayê de dijîn û Îran û Sûriyê jî piştgiriyê ji wan dikin. Bêşik di rewş û zirûfekê de jî ninin ku bi êşandina wan du dewletên piştevanê xwe, di refa Erebên ne tundrew da cih bigirin.

Di wan çend rojên borî de Amerîka û YE’ê alîkariyên xwe yên malî bi dewleta Felestînê ku nêzîk bi 1 milyar Dolara re qut kirin û ragihandin ku destpêkirina alîkariyên malî bi Felestînê, girêdayî bi bersiva erênî ya Hemasê û dewleta niha ya Felestînê bi xwestekên girûpa çar alî pêkhatî ji (Amerîka, Rûsiya, YE û Neteweyên Yekbûyî) ku li serweyî hemûyan bi fermî nasîna Îsraîlê ye. Ji aliyê din jî Îsraîlê dest li ser zêdetir ji 50 milyon Dolar ji dahata bidestve hatî ji maliyat û gumrikê bi hikûmeta otunom a Felestînê de girtiye.

Ji hêleke din jî tu yek ji welatên Erebî jî naxwazin bi bihêzkirina Hemasê dijî Amerîkayê rawestin û ji alîkariya Îranê jî ku gotibû ji bo alîkarî dan bi xelkê Felestînê 50 milyon Dolar terxan kiriye, tu xeber nine.

Bi vî awayî Felestîn di kirîz û pirsgirêkeke mezin ya malî de ye. Bi terzekê ku xezîneya malî a dewletê vala ye û welat nikare perê mehane yên karmendên xwe bide. Hemû ew pirsgirêkane dibine sedema çêbûna bûyer û tirajidiyek mirovî di Felestînê de.

Ji aliyek din jî Mehmûd Ebas, Serokê Bizava "Feth" û Dewleta Felestînê ku qutbûna alîkariyên malî yên Amerîka û Ewropayê bi tirs û xetereke mezin dizane, ji aliyekê cehdê dike Hemasê razî bike ku Îsraîlê bi fermî nas bike û ji aliyê din jî bi mifah wergirtin ji yasayên bingehîn yên Felestînê, Seîd Seyam di pêkanîna hêzeke ewlekarî ya wekî hêza ewlekariya li bin desthilata xwe de (Mehmûd Ebas) red kir. Ji aliyê din ve jî hilbijartin û nasandina Cemal Ebo Sehmdan ji bo berpirsyetiya hêzên ewlekarî, ku yek ji wan kesane ye ku Îsraîl lê digere. Lewra ev kare bo cihê nerazîbûna Îsraîlê û Amerîka bi dijî Hemasê û wan Hemas tawanbar kir ku di hilbijartina navhatî kakila xwe ya terorîstî bi başî da xuya kirin.

Ji hêla din jî Felestîn niha dewam û qonaxek ji desthilatdariya du hikûmetî derbas dike, ew du hikûmetîbûnê dewlet ji kar xistiye û heke ew rewşe dewam peyda bike, civaka Felestînê tevî pirsgirêkên mirovî rûbirû dike. Lê ji bo çareserkirina van du sîstemên hikûmetî rêyên aştîxwazane yên zor tune ye. Yek ji wan rêyên aştîxwazane eva ye ku Mehmûd Ebas ji berpirsyariya xwe dest berde, lê dest li kar berdana wî dibe sedema zêdebûna zext û givaşa navneteweyî li ser Hemasê û ev kare dibe sedema tund û tûjiya zêdetir.

Rêya din ewa ye ku dewleta Hemasê dest ji şolê hilgire, lê bi liberçavgirtina nifûza ew girûpane di civaka Felestînê, dest hilgirtin ji desthilatê dibe sedema ne ewlehiya zêdetir di Felestînê de û tund û tûjiya zêdetir. Tenê rêya ku dimîne ewa ye ku Hemas helwêsta stiratejîk ya xwe biguhere û xwe tevî siyasetên Mehmûd Ebas di rêya aştiyê tevî Îsraîlê rê bixe.

Guherînên han li siyasetên Hemasê kirîza du hikûmetî ya di welatê Felestînê de serbarê hemû ev pirsgirêkene, bi terzeke bingehîn çareser dike.

Jêder:
-"Voa news"
-"BBC persian"
-"iran – chabar"

www.arsivakurd.org

Zimanzan û Ferhengkarê Kurd Zana Farqînî:

HETANÎ KURD NEBIN XWEDÎ Û SERWERÊ WELATÊ XWE, ZIMANÊ WAN JÎ, NABE ZIMANEK SERDEST

Hevpeyvîn: Letîf Epozdemir/Stenbol

ZANA FARQÎNÎ KÎ YE ?

Zana Farqînî, yek ji zimanzan û Ferhenkarê herî mezin yê Kurdistana Turkiyê ye. Zana hetanî niha di gelek kovar û rojnameyên Kurdî de, xebitiye û her wiha ji gelek miqale û nivîs nivîsandiye. Li ser ziman û rêziman û biwêjên zimanê kurdî gelek xebatên wî yên bi nirx hene. Zana, xwediyê mezintirîn Ferhenga Kurdî ye ku hetanî niha li Turkiyê çap bûye. Sedem kar û barên derheqê peydakirin û kom kirina peyv û kelîmeyên Kurdî, li Turkiyê ji Zana re dibêjin "NÊÇÎRVANÊ PEYVIKAN"

Zana, di xebatên xwe de hetanî niha gihîştiye 166000 kelîmeyên Kurdî. Du ferhengên Zana FARQÎNÎ hene. Yek "FERHENGA TURKÎ-KURDÎ" û ya diduyan jî: "FERHENGA KURDÎ- TURKÎ". Ev Ferheng ji 135.000. peyvên Kurdî pêk hatine û tenê bi Kurmancî ye.

Em dizanin ev demeke dirêj e ku tu di Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê de dixebitî. Der heqê kar û barên Enstîtûyê de tu dikarî çi bibêjî? Tu di kîjan beşî de kar dikî û Zana Farqînî heya îro di çend deveran re derbas bûye?

Rast e, çendî ku ez ji sala 1997'an bi vir de, em bibêjin bi awayekî profesyonel li Enstîtûyê dixebitim jî, lê ez ji destpêke ve di nav kar û barê wê de me.

Wek tê zanîn, Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê di 18'ê Avrêla (Nîsana) 1992'an de hatiye avakirin. Ji wê demê û heta niha, enstîtu di gelek gêdûkan re derbas bûye. Ez naxwazim bi kitekit û yeko yeko li ser bûyer, rûdan û tiştên ku hatine serê wê, rawestim. Di nav çardeh (14) salan de, me gelek xebat pêk anîn. Ev xebat jî, tev de xebatên endamên me ne.

Giraniya xebatên me li ser ziman, dîrok, wêjeya klasîk û zargotina kurdî ye. Di van waran de em bawer dikin ku xebatên girîng û hêja hatine kirin û encamên van xebatan jî wek weşan ji raya giştî re hatine ragihandin. Çend berhem ne tê de, hemû berhemên me bi kurdî ne. Ev xebatên ku heta niha ji aliyê enstîtûyê ve hatine kirin, çendî hem ji aliyê hejmarî (çendaniyê) û hem jî ji aliyê çawaniyê (wesfê) ve ne bi dilê me bin jî, dîsan em difikirin ku me wek sazî xebatên baş kirine.

Ji ber pirsa we ya ka ez di çi beşê de kar dikim û her wiha di çend deveran re derbas bûme, ez van agahiyan bidim. Ez bi xwe niha hem endamê desteya kargêr a saziyê û hem jî serokê beşa zimên im. Min di kovara Rewşen a Navenda Çanda Mezopotamyayê de (sala 1991) pêşî dest bi karê weşangeriya Kurdî kiriye. Ez endamê desteya nivîsaran a vê kovarê bûm. Piştre min di rojnameya **Welat** de dest bi karê redaktorî û edîtoriyê kir, ku em dikarin bibêjin ew rojnameya tekane ya xwerû bi kurdî bû ku li Bakur û Tirkiyeyê gav avêtiye gorapana weşankariyê. Wek tê zanîn weşana bi navê Rojname, bi hejmara xwe ya provayê beriya wê derçûbû, lê piştre berdewamî nedabû weşana xwe. Paşê, piştî ku rojnameya Welat hate girtin, me îcar di **Welatê Me** de karê xwe berdewam kir û ez bûm berpirsê karê nivîsaran ê wê yê pêşîn. Ji ber çend nivîsar û nûçeyên hejmarên wê yên cuda cuda, min ceza xwar. Min li Dadgeha Ewlekariyê ya Stenbolê bi kurdî îfade da. Ez ketim girtîgehê.

Piştî ku ez ji girtîgehê derketim, ez bûm gerînendeyê wê yê weşanê (midûrê Weşanê). Heta ku rojname hate girtin, min ev kar domand. Li dawiyê ev rojname jî hate girtin û me ligel çend hevalan zend û bendên xwe ba dan û me îcar rojnameya **Azadiya Welat** derxist. Her wiha ez bûm gerînendeyê weşanê yê pêşîn ê vê rojnameya heftane jî.

Ji ber cezayê ku li min hatibû birîn, esehî û aşkera bû, min dev ji rojnamegeriyê berda û ez ketim kargêriya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê. Jixwe xebat û lêkolînên min ên li ser zimanê kurdî her berdewam bûn. Di sala 1997'an de min dest pê kir û min her du ferheng amade kirin. Pêşî ferhenga tirkî-kurdî (di sala 2000'î de) û di pey wê de jî ferhenga kurdî-tirkî (di sala 2004'an de) amade kir.

Zimanê Kurdî di tu qonaxa dîrokê de nebûye zimanê perwerde û fêrbûnê. Her wiha nebûye zimanê fermî û ji bo pêşdeçûyînê alîkariya desthilatan nedîtiye. Ziman di mercên wiha zehmet de ber bi windabûnê ve diçin. Çawa dibe ku zimanê Kurdî hetanî îro hebûna xwe parastiye?

Belê, ev gotinên we hewceyî lêkolînê ne. Ez bi tevayî tevî van gotinên we nabim. Lê eger mebest ji van gotinan ev be ku heta Kurd nebin xwedî û serwerê welatê xwe, zimanê wan jî nabe zimanê serdest û di her warê jiyanê de nayê bikaranîn, ez jî li ser gotina we me. Ligel vê rewşê jî, divê ku dîsan mirov medreseyan qet ji bîr neke. Çendî ku di van medreseyan de zimanê kurdî di rêza diduyan de be jî.

Em bi çend gotinên kurt li gorî Bakurê welêt çêlî rewşê bikin. Li Bakur heta destpêka damezirîna Komara Kemalî rewşeke cuda heye. Piştî avakirina Komara Tirkiyeyê, siyaseteke nû serwerî her tiştî dibe. Êdî dema rejîma Kemalî ye û tekparêzî (monolîzm) heye.

Piştî ku medrese tên girtin û li her derê dibistan tên vekirin, rewşeke nû ji bo zimanê kurdî dest pê dike. Her wiha zimanê kurdî tê qedexekirin. Wekî ku hûn jî dizanin, zimanê fermî, zimanê perwerdehiyê, zimanê çandê, zimanê hevpar, em kin lê bixin tirkî ye û di her warê jiyanê de serdest e û bergeh bi temamî jê re hatiye firehkirin.

Zimanê radyoyan, zimanê çapemeniyê, zimanê televîzyonan ne kurdî, lê belê bi tirkî ye. Her ku bandor û hîkariya dem û dezgehên rejîmê li bakurê welêt zêdetir dibe, bişivîn û helîna (asîmilasyona) kurdan jî pê re zêde dibe. Êdî di jiyana rojane de jî, zimanê kurdî serî ji tirkî re datîne. Em bi rihetî dikarin bibêjin ku, li deverên gundewar hîn jî zimanê kurdî serdest e, lê

www.arsivakurdi.org

asîmilasyon zora van deran jî dibe. Em dibînin ku zimanê kurdî li van deran jî li ber zimanê tirkî têk diçe, derbe dixwe, qels û lewaz dikeve. Mixabin, dilê min ji vê yekê pir û pir diêşe, lê ez rewşê wiha dibînim.

Îcar çima gelo komara Kemalî ku ji heştê salî zêdetir e, tehde li Kurdan û zimanê Kurdan dike û ji bo ku Kurdan di nav xwe de bibişêve, wan bişibîne xwe, bi kurtasî asîmile bike, çi ji destan tê dike jî, nikare zimanê Kurdî bi tevahî ji holê rake, an jî hetanî niha bi ser neketiye?! Sedemên vê yekê ne yek, gelek in. Kurd neteweyeke dêrîn û kevnar e, Kurd bi hezaran sal in ku li ser axa bav û kalên xwe ne. Jiyan û jiyara wan a civakî ku mîna êl, hoz û tîreyan dijîn, cografyaya wan, karekterên wan ên neteweyî, rewşa wan a xwendewarî û nexwendewarî, kevneşopiya wan a zargotinî, jiyana wan a olî, helwesta wan a siyasî, mercên wan ên aborî û howd. kirine ku siyaseta asîmilasyonê li ser wan bi ser nekeve.

Hewce ye em bînin bîra xwe ku kurd di dema Osmanî de jî û ji destpêka avakirina komarê de jî tim di nav xebatên siyasî de ne. Her bi rejîmê re têkoşiyane, serî hildane, xwe li çiyayên xwe girtine. Ev rewşa hanê jî rê li ber siyaseta dewleta Tirk girtiye, nehiştiye ku ew mirad bi armancên xwe bikin, kurdan bihelînin û biqelînin.

Li gor zanîna te di zimanê kurdî de çend peyv û biwêj hene? Ferhenga te ya bi nirx ji çend peyva pêk hatiye, berhema çend rojan e?

"ZENGÎNIYA ZİMANÊ ME, HER KESÎ DIHEYIRÎNE."

Bersivandina vê pirsa te gelek zor e. Ji ber ku hîn zimanê kurdî bi tevayî nehatiye tomarkirin û qeydkirin. Ango hemû peyv û biwêjên wî, neketine ferhengan. Tiştê ku ez dikarim der barê zimanê kurdî de bibêjim ev e. Min di ferhenga xwe ya kurdî-tirkî de ku di sala 2004'an de derket, cih daye 166 hezar madeyî. Eger ez bi gotineke din bibêjim, ferhenga min a navborî ji 131 hezar madeyê destpêkê û ji 35 hezar madeyên berdewam (biwêjan/îdyoman) pêk tê. Ev ferheng jî, bi tevahî Kurmancî ye. Ev gotinên ku ez dibêjim gişt ji bo zaravayê Kurmancî, Kurmanciya Jorê ne.

"ZIMANÊ KURD MÎNA DERYAYEKÊ YE"

Ez hîn jî bi berdewamî peyv û biwêjên nû li vê ferhengê zêde dikim. Karê min ê berhevkirinê bêrawestan didome û ez şaş û metel dimînim ku, ew çend bêje û îdyom di zimanê me de hene. Bi rastî, bêyî ku ez pirole (mibalexe) bikim, zimanê me mîna deryayekê ye. Ev aliyekî wê, aliyê din jî hingî zargotina wê dewlemend e, mirov tim û tim rastî bêjeyên nû, an jî leqayî wateyên wan ên din tê. A ev zengînî û dewlemendiya zargotinê jî bûye asteng û kelemekî mezin li pêşiya asîmilasyonê.

Zengîniya zimanê me her kesî diheyirîne, tev em dev ji tirkan berdin gelek kurdên me yên xwende, rewşenbîr û pêşeng jî bawer nakin ku zimanê kurdî ev çend dewlemend e. Ji min dipirsin û dibêjin tev ev qas peyv ji ku anîn, a niha bera ev peyv hemû bi kurdî ne û hwd.

Em wisan ji xwe, ji eslê xwe dûr ketine ku baweriya me jî êdî bi me, bi zengîniya çand, huner, edebiyat, zargotin û zimanê me nayê. Ew qas jî nabe, mirov ew çend jî ji xwe re nabe biyan heyra.

Heta ku em nebin serwerê xwe û li her bihostê axa bav û kalên xwe bi rihetî negerin, zargotina xwe berhev nekin, berhemên xwe yên klasîk venekolin, xebatên meydanî nekin, em nikarin bibêjin ku, ew qas peyv û biwêj di zimanê me de hene û zimanê me xwedî gencîneyeke ev çend mezin û zengîn e. Cihê gencîneya peyvên zimanê kurdî di nav zimanê cîhanê de ev e û her wekî din.

"FERHENGA KU MIN AMADE KIRIYE, JI 135.000. PEYVÊN KURDÎ PÊK HATIYE"

Serokê Enstîtûya Zimanê Kurdî ya Diyarbekirê birêz Ebubekir Çelebî dibêje ku bila zaravayê Soranî bibe zimanê gelemperî yê Kurdan. Hûn di vî warî de çi difikirin?

Der barê zaravayên Kurdî de, ez xwedî ramaneke cuda me. Li ba dilê min hemû zaravayên (dîyalektên) Kurdî şîrîn in û min navêt ku kurd ji hemû zaravayên xwe zaravayeke nû dirust bikin. An jî, ji nav zaravayan zaravayek ji bo zimanê fermî, zimanê hevpar (muşterek) hilbijêrin.

Wekî ku tê zanîn, gava di destpêka sedsala bîstî de netewe dewlet ava bûn, rêbaza tekparêziyê (monolîtîkiyê) ji xwe re bijartin. Kadroyên avaker û damezirînerê netewe dewletê her tiştê xwe li ser tekîtiyê ava kirin. Tek ziman, tek çand, tek nîjad, tek ol û nizanim tek çi û ne çi. Ev yek li gorî ruhê felsefeya netewe dewleta wê demê dihat kirin. Lê îro ev felsefe diguhere. Karakterên dewletên neteweyî jî diguherin. Piranîparêzî (pluralîzm) tê tercîhkirin, dev ji tekanîtiyê tê berdan. Pêwîst e ku em jî li gorî vê rewşa nû tev bigerin û ji derdên xwe re li çareyan bigerin. Şaşî û çewtiyên ku niha gelên pêşketî, gelên cîhana biserketî dev ji wan berdidin, em nekin. Divê ku tecrûbeyên wan, ezmûnên wan, kir û kiryarên wan ji me re bibin rênîşander û berxweşker.

"TÊKOŞÎNA ME, DIVÊ JI BO BERBIHEVANÎNA ZARAVÊN ZIMANÊ KURDÎ BE"

Li aliyê din, ez alîgir im ku her zarava li ser warê xwe serwer be û her zarava di nav xwe de bibe xwedî standardekê, bibe xwedî pîvaneyên hevgirtî, yekgirtî. Ev jî têr nake divê ku hemû zaravayên kurdî ji bo ku zarava ber bi hev de werin, ji hev peyv û bêjeyan, terîm û têgihan bigirin. Ji bo ku lîteratûra wan nêzî hev û din bibe, xebatan bikin. Peyvên wan ên ku eynî ne, divê di zimanê nivîskî û axaftinê de derkevin pêş. Ango, hewce ye ku em alî û layên wan ên ku nêzî hev in, derxin pêş, ne hêl û aliyên wan ên ku dûrî hev in.

Têkoşîna me divê ji bo berbihevanîna zaravayan be, ne jihevdûrxistina wan be. Dibe ku ji bo me zaravayek bibe zimanê fermî û hevpar. Lê ev jî ne bi darê zorê, divê li gorî rezamendî û qebûla raya giştî be. Qet nebe li gorî zemînê û rastiya me kurdan be, ku cemawer bipejirîne. Hewce ye em şert û mercên dîrokî, siyasî, civakî û çandî jî li ber çavan bigirin û wisan der barê zimanê hevpar de tev bigerin, biryaran rast, biryarên pêkhênanbar û qebûlbar bidin.

Li aliyê din, gerek em rewşa kurdan li ber çav bigirin. Min divê ez bi bîr bixim ku zimanê hevpar li ser axeke rizgarbûyî, li ser warekî ku mirov li serê fermanrewa ye, pêk tê. Kurd îro ji hev parçekirî ne. Tenê bi biryaran tişt pêk nayên. Ango bi duayan ev tişt çê nabe. Jê re îradeya siyasî divê, desthilatî û statûyeke siyasî divê. Karîn û şiyanên din divên.

Derheqê zaravayên di zimanê kurdî de dîtinên te çi ne? Li gora raya te kêşeya alfabeyên cuda yên di nav kurdan de wê çawa çareser bibe?

Ez naxwazim careke din bikevim nav mijara zaravayên kurdî. Ji ber ku min hizir û ramanên xwe li jorê diyar kirin. Bi ya min, helwesta min a der barê zaravayan de, ron û ronak e. Der heqê hejmara zaravayên zimanê kurdî de gelş û arîşe heye. Li ser hejmara zaravayan lihevkirinek di nav zimanzanên me de nîn e. Her wiha, der heqê devokên van zaravayan de jî hejmar hev nagirin. Tev bi ser de, li ser navlêkirina van zarava û devokan jî termînolojiyeke me ya hevgirtî nîn e. A di van waran de pêwîstî bi xebatên zanistî yên ku rewşê zelal bikin heye.

Der barê hejmara zaravayan de,

www.arsivakurd.org

hinek serê min zelal e ku hejmar jî çar an jî pênc e. Hin kes Hewremanî-Goranî û Kirmanckî/Zazakî wek zarava dibînin û hin jî nabînin. Loma hejmar an çar an jî pênc e. Bi rastî pîvaneyên ku ziman û zaravayan ji hev kifş û diyar dikin, ew çend ne zelal û vebir in.

" WISA TÊ XUYA KIRINÊ KU KURD BI PIRANÎ ALÎGIRÊ BIKARANÎNA ALAFBEYA LATÎNÎ NE"

ELFABEYA KURDÎ, ÇIMA DIVÊ KU YA LATÎNÎ BE?

Bi ya min, roja îro alozî, kêşe û gelşa li ber me ku divê di zûtirîn demê de em çareser bikin, alfabeyên cuda ne ku îro em kurd wan bi kar tînin. Ev bi xwe jî meseleyeke siyasî ye û divê ku dîsan statû û desthilatiya me hebe ku vê biryara siyasî bide. Eger ku ez bi awayekî din bibêjim, ev rewş hinek jî bi rewşa dewletên serdest ên kurdan ve girêdahî ye. Ji ber ku li Tirkiyeyê jixwe alfabeya Latînî tê bikaranîn, rayedarên tirk pê razî dibin ku kurd jî alfabeya Latînî ji bo xwe bi kar bînin. Eger Îran, Sûriye û Îraq jî ne alfabeya Erebî lê ya latînî bi kar bianîna, ji xwe rewşeke wiha dernediket pêşiya me.

Em bînin bîra xwe ku beriya Celadet Bedirxan alfabeya Latînî ji bo zimanê kurdî amade bike, kurdên me yên li Ermenîstanê dest bi perwerdehiya kurdî ya bi tîp û pîtên latînî kiribûn. Lê paşê ji ber sedemên polîtîkî neçar man û vegeriyan ser alfabeya Kirîlî.

Çendî ku hin kes hene meyla wan li ser bikaranîna alfabeya Erebî ye jî, lê ji min re wisan tê ku Kurd bi piranî alîgirê bikaranîna alfabeya Latînî ne. Sedemên min bi xwe jî hene ku divê çima alfabeya Latînî be.

Ji ber ku dê zêde wext bigire, min navê ez têkevim nav dabaşa alfabeyê. Min tenê xwest ku ez der barê alfabeyê de hizir û nêrîna xwe derbibim û aşkera bikim bê ez çi diramim.

Niha li ser çi dixebitî? Gelo ma ne qabil e ku ferhengeke mezin were çêkirin ku tê de hemû zaravayên kurdî hatibin berawirdkirin û şîrovekirin?

Wexta min dest bi amadekirina her du ferhengan kir (ferhenga tirkî-kurdî û ya kurdî-tirkî) hin kesan daxwaz kir ku divê ferheng ji hemû zaravayan pêk bên. Min ev yek nepejirand. Sedem jî ev bû. Hîn zaravayên me xwe di nav xwe de zelal nekirine. Nebûna xwedî standard û pîvaneyekê. Ferhengên wan nîn in. Gelê me nikare hîna bi zaravayê xwe bixwîne û binivîse, dê çawan karibe ji ferhengeke welê têkilhev sûd wergire?!

Ê min, fikira min ew e ku divê her zarava pêşî gelş û arîşeyên xwe çareser bike, ferhengên xwe amade bike. Paşê hewce dike ku mirov ferhengeke ku ji hemû zaravayan pêk tê amade bike. Ev jî ne ku peyv û biwêj di nav hev de bin. Divê beşê zaravayan ji hev cuda bin. Ev yek, ya duyemîn jî divê ku ferhengeke me ya hevberiyê, ango ya berawirdiyê hebe ku peyv û bêjeyên zaravayên me li hemberî hev nivîsandî bin, da ku mirov zanibe ka li berginda filan peyva bêvan zaravayî kîjan peyv heye an jî hene.

Ferhenga hevberiyê jî bêhtir bi kêrî zimanzanan, bi kêrî nivîskaran û kesên ku bi ziman re eleqedar dibin, tê. Bi kêrî

Zana Farqînî:

DI HIŞYAR KIRIN Û AZAD KIRINA MILETAN DE, ROLA EDEBİYATÊ GELEK MEZIN E

siyaseta me ya ziman a giştî tê, ku divê em zaravayan ber bi hev bînin û peyvên wan ên hevpar derxin pêş, her wiha divê ku em di pirtûk û kitêbên xwe yên ji bo perwerdehiyê de jî, vê siyasetê bimeşînin.

"JI BONA ZIMAN, DESTHILAT GELEK GIRING E. "

Pêşdeçûyîna ziman û serxwebûna welat çawa li hev tesîr dikin? Ziman di mercên derveyî serxwebûnê de jî dikarin bêasteng xwe bi pêş de bibin û bibin zimanê perwerdeyê?

Ji bo ziman, desthilatî zehf girîng e. Heta mirov li ser warê xwe nebe, xwedî statûyeke siyasî, mirov ji her tiştî mehrûm dimîne. Rewşa kurdan li her derê li ber çavan e û hewceyî wisan analîzên kûr û dûr jî nake. Tu çiqas serwerê xwe bî, tu çiqas azad û serbest bî, tu çiqas desthilat bî, tu ew çend heyî. Çanda te jî, zimanê te jî, wêje û şanoya te jî, bi kurtasî zanav û nasnameya te jî ew çend heye. Mesele li vir bi rewşa mirov ve ye. Ji lew re îro li dinyayê ziman bi xwe jî hatine senifandin ango kategorîkirin. Zimanên neteweyî û zimanên hindikahiyan, zimanê kêmneteweyan, zimanên herêmî û navçeyî. Li aliyekî zimanên neteweyî ku di rastiya xwe de ew zimanên serdest û li aliyê din jî zimanê ne neteweyî ku ew jî zimanên bindest in.

Heta ku zimanek bindest be, wekî gelê xwe ma dikare wekî zimanekî serdest tev bigere û di her warî de bê bikaranîn?

Îro li dinyayê qet nebe, ji ber rewşa me ya li Başûrê Kurdistanê, zimanê kurdî dibe zimanekî fermî û neteweyî. Lê li Tirkiyeyê statûya zimanê kurdî hîn bi awayekî resmî nîn e. Ji ber ku Tirkiye xwedêgiravî dixwaze têkeve nav Yekîtiya Ewropayê, qanûnek ji bo çapemeniyê (masmediyayê) derxist ku ji bilî tirkî bi zimanên din jî karibe weşan û pexş bê kirin. Navê vê qanûnê eger ew wergerînin kurdî ev e: Ziman û Zaravayên Cihkî (lokal) ên ku Welatiyên Tirk di Jiyana Xwe ya Rojane de Bi kar tînin.

Belê li vir zimanê me yan zimanekî herêmî yan jî zaravayekî cihkî ye. Peymana Çarçoveyî ya der barê Zimanê Hindikahî an jî Zimanê Herêmî de, peymaneke Yekîtiya Ewropayê heye. Loma Tirkiye jî rabû bi vî navî qanûneke nû derxist.

Ma gelo, di rewşekê ku zimanê mirov ne azad be, tehde li ser zimanê mirov hebe, mirov dikare behs û çêla pêşketina zimên bike? Ma gelo perwerde û hîndekariyeke serketî bi vî zimanî dibe?

Ziman bêyî mirov nabe. Ez çiqas azad û xwedî maf û azadiyên xwe bim, ew çend jî zimanê min serbest e. Mafê ziman mafekî mirovî, çandî û demokratîk e. Mafekî kolektîf e.

Heta ku zimanek nebe zimanê perwerdehiyê, nebe zimanê fermî û di her warê jîn û jiyarê de neyê bikaranîn, ew ziman nikare xwe li ber zimanên serdest ragire û têbikoşe. Wekî din ziman neyê qedexekirin jî, bi doman û qonaxa demê re zimanê bindest qels dikeve, jar û lewaz dibe û hêdî hêdî ber bi windabûnê diçe. Geşbûna xwe winda dike û wek roniyekê zenûn dibe û vedimire.

Tu rewşa Kurdistana Başûr çawa dibînî? Di warê ziman, çand û edebiyatê de lazim e ku çi bikin? Divê pêwendiya wan parçeyên din ên Kurdistanê digel Başûr çawa be?

Ev pirseke girîng û bersivandina wê jî ew çend dijwar e ji bo min. Lê hemin we ji min pirsî ez jî raman û hizirên xwe derpêş bikim. Bi ya min, beriya her tiştî divê ku em bi zêhniyeta parçeyan li xwe nenêrin. Em yek parçe ne. Gava ku em wiha bihizirin, wiha biramin dê karê me hêsan be û çareserkirina gelşan jî xweştir û hêsantir bibe.

Bi qasî ku em jê agahdar dibin, bi qasî ku em ji televîzyonên ku li Başûr weşanê dikin agahdar dibin, rewş her diçe xweştir û baştir dibe. Pêşketin di her warî de çêdibin. Di warên siyasî, civakî û aborî de gavên dilxweşker tên avêtin, em bi van yekan gelek şad û kêfxweş dibin. Bi saya van geşedan û pêşketinan çokên me bêhtir dişidin, dilê me bêhtir germ û zindî dibin. Carinan ji kêfan stêrk û rondik ji çavên me tên xwarê. Hem hestgerm û dilzîz dibin. Ev yek tev ji kêfan in.

Divê ku berê me li Rojava be, li cîhana pêşketî be û em hemû dem û dezgehên demokrasiyê di nava xwe de bicih bikin. Li gorî normên cîhana şaraza tev bigerin. Bi welatiyên xwe re xweş bidin û bistînin. Çalakiyên çandî, hunerî û edebî xurtir û geştir bikin. Ji deverên din kesên xwe yên pispor bînin nava xwe. Ji wan sûd û kelk wergirin. Bi wan jî jiyana xwe ya çandî xurtir bikin. Ziman û çand bi hev ve, bi awayekî hişk û pihêt bi hev ve girêdayî ne. Ziman hîmê çandê ye. Çand dike ku bi me hemûyan re giyaneke hevpar, ruhekî neteweyî yê giştî çêbe.

Dan û stendin, çûn û hatin divê ku tim di navbera parçeyan de hebe. Hewce ye ku em hêvî û roniyê bidin hev û din. Em gişt ji bo hev in. Herêmparêzî, navçeperestî divê di nav me de qet cih nebîne. Beriya her tiştî divê ku em bibin kurdistanî, bibin civakeke kurd û her gelş û gelemşeyê, her pirs û pirsgirêkê, her alozî û arîşeyê ya xwe bibînin û ji bo çareserkirinê jî, ji tu tiştî texsîr nekin.

Der heqê edebiyata kurdî de dîtinên te çi ne? Pirsa herî girîng a edebiyatê çi ye? Çi tesîreke edebiyatê heye li ser hişyarbûn û azadbûna miletên bindest?

Ma em edebiyatê, wêjeyê ji çandê cuda dikarin bihizirin? Ma em dişên bibêjin ku wêje cihê ye û kultur cihê ye? Na, ziman maka hemû hunerên gotinkî ye. Çi tiştê ku bi riya zimên tê afirandin, ziman dayika wan e. Ji ber çi ez dibêjim ziman, divê ez wê aşkera bibêjim. Eger ku em dixwazin xwe ji rewşa kambax ku dibêjin zimanê kurdî zimanekî paşvemayî û ne zengîn e, rizgar bikin, divê ku em hemû çalakiyên xwe bi vî zimanî bikin. Ku edebiyat jî bi riya zimên tê afirandin û kirin. Nexwe, hewce bi berhemên gelek hêja yên ji çeşnê edebî heye. Ev çeşn dikarin bibin şano, sînema û her wekî din. Bi van hest û nestên mirov ên neteweyî xurt û zindî dibin. Bi wan mirov bi xwe ewle dibe, baweriya mirov bi zanav û nasnameya mirov tê. Bi serbilindî mirov tev digere. Mirovê şikestî mirovê kole ye, ew mirov amade ye bikeve bin xizmeta her kesî. Lê mirovê ku bi xwe, bi nasnameya xwe bawer e û pê re hişmendiya neteweyî çêbûye, têkoşer e, berxweder e li hemberî tehde û pestên nîjadperestî yên dewletên serdest.

Di nav me kurdan de hîn jî di warê edebî de derbûnek pêk nehatiye. Di hemû warên çeşnê edebî de ku divê serê mirov bi xwe bilind bikin û em kurd tev de şanaz bibin ku em xwedî berhemên wiha ne, mixabin hîn nîn in. Nivîskarên xurt, nivîskarên zîrek divê ji nav me rabin û berhemên wan li zimanê cîhanê jî bên wergerandin. Edebiyata me jî divê ku bi zimanê me be.

Di hişyarkirin û azadkirina gel û miletên bindest de, rola debiyatê, rol û dewra şano, sînema û muzîkê gelek mezin e. Jixwe şoreşa Oktobrê şoreşeke edebê ye. Edebiyatê zemîn ji bo şoreşê amade kir. Ma ev mînak bi tena serê xwe jî ne bes e. Îro miletên serdest bi xAwe jî, bi riya çalakiyên xwe yên çandî lê dixebitin ku manewiyata xwe xurtir bikin. Ma îcar em gelên bindest, divê hîn bêhtir pûte bi vê yekê bidin. Divê ku em qedr û qîmeta van çalakiyan û kesên ku bi van çalakiyan radibin, pir zêde bigirin. Ez miletên bêçand, edebiyat, muzîk, şano û sînema dişibînim çewal û telîsekî vala ku tu nikarî wan tik û çik li piyan bigirî. Lê çewalê tijî û dagirtî, tik li piyan disekine.

"DERSXANEYÊN KURDÎ NE TENÊ JI BER REWŞA ABORÎ HATIN GIRTIN "

Ne tam be jî be îro li Tirkiyeyê zimanê kurdî ji bin nîrê qedexebûnê derketiye. Lê qursên kurdî vebûn û nekarîn xwe ragirin, ji lew re di demeke kin de hatin girtin. Der heqê van bûyeran de hûn dikarin çi ji me re bibêjin? Bi raya te îro di dibistanan de zimanê kurdî bibe zimanê perwerdehiyê wê kurd zarokên xwe bi zimanê dayikê bidin xwendin?

Belê, niha rê hinek li ber zimanê kurdî hatiye vekirin. Qet nebe li ser kaxizan û di qanûnan de ev yek heye û rastiyek e. Lê di kardariyê (pratîkê) de rewş cuda ye. Bi her awayî rê li ber çalakî û weşanên bi zimanê kurdî tên girtin. Ev serê pazdeh salan e ku qanûna weşan û her cure çalakiyên bi zimanê kurdî qedexe dikir, hatiye hilanîn. Lê rejîm tu car nehişt ku rojnameyeke kurdî mezin û tîraja wê zêde bibe. Meseleya weşanên kurdî kiriye mîna rewşa marê nîvkuştî. Ne dihêle bimire û ne jî dihêle bijî. Ew di navbera nemir û nejînê de ne. Ev polîtîkayeke dewletê ye ku bi zanebûn li ser me pêk tîne.

Piştre mafê hîndekariya zimanê kurdî hat dayîn ku ev jî divê muteşebîs bi xwe bikin ne ku dewlet bike. Lê mafê pexş û weşana bi zimanê kurdî di pawana (înhisara) xwe de hişt. Jixwe bi vê kir û kirina xwe dewleta Tirkiyeyê niyet û mebesta xwe aşkera kir.

Îcar li dersxaneyan jî mafê hîndekariya bi zimanê kurdî ji gelek aliyan ve hat vesînorkirin (mehdûtkirin). Mesela kesê ku 18 salî nebûbe nikare were qeyda xwe çêke, kesê ku bi tirkî nizanibe nikare serî li qursê bide û gelek asteng û berastengiyên din. Mebest ji rêvebernameya (nîzamnameya) van dersxaneyan jî ev e ku ne zarok lê belê kesên mezin ancax karibin bi pereyên xwe, xwe hîn û fêrî zimanê kurdî bikin. Biçûk na mezin, ma me ji vî karî çi fehm kir!

Kurd welatiyên Tirkiyeyê ne, baca xwe didin, erk û peywirên xwe, berpirsiyên xwe yên li hemberî dewletê tînin cih, lazim e ku dewlet jî bi heman awayî erk û berpirsiyên xwe yên li hemberî welatiyên xwe bîne cih û wisan nêzikayî li kurdan bike. Lê wisan nake. Ev helwesta ku berpirs û karbidestên dersxaneyên hînkirina zimanê kurdî nîşan dan û xwe girtin, helwesteke siyasî bû. Ne ku tenê ji ber rewşa aborî hatin girtin.

Neteweyek nabe ku zimanê xwe li dersxaneyên taybet û bi pereyên xwe hîn bibe û bihewise. Ev ji bo kurdan şerm û fediyeke mezin e. Helbet ku dibistan jî bên vekirin û ew jî bi pereyan bin, ez di şûna kurdan de bim, ez zarokên xwe naşînim wan dibistanan. Ez dê protesto bikim. Divê ku mafê hînbûn û perwerdekirina bi zimanê kurdî eynî mîna yê tirkî li dibistan pêk were û ev jî bi destê dewletê be. Hem jî mecbûrî be. Ji dibistana destpêkê heta zanîngehan hewce ye ku hîndekarî û hêvotin ango perwerde bi kurdî be. Statûya kurdî jî bi qasî ya tirkî be. Heke na, dê kurdî her biçe li hemberî tirkî têk biçe û şikestê bixwe.

Bala xwe bidinê, îro li Tirkiyeyê gava ku malbatên zengîn zarokên xwe dişînin dibistanên taybet ên bipere, mebesteke wan, armanceke wan heye. Di van dibistanan de bi zimanê biyanî perwerde tê dayîn. Ango Hêvotin bi îngilîzî û her wekî din e. Ji bo ku ji zarokên xwe re dahatû û ayendeke geş amade bikin, pere dirêjin. Hûn dêhna xwe bidinê, ne ji ber ku li wan dibistanan bi zimanê tirkî perwerde tê dayîn. Rastiyek heye, kesên ku ji van dibistanan derdiçin, ji yên din bextewar û bisihûdtir in. Di zûtir demê de ji xwe re kar hem jî karên baştir û dibînin ku mûçe û mehaniya wan jî zêde ye.

Îcar di rewşeke wiha de dê çima malbatên kurd dibistana bi kurdî ya bi pereyan tercîh bike?! Du aliyê vê rewşê divê hebe. Yek carek dewlet divê mecbûrî bi kurdî jî perwerdeyê bike. Her wiha kes ango şexs jî karibe wek muteşebîs dibistanên kurdî jî veke. Îcar her kes di tercîha xwe de serbest û azad e.

Wekî din divê ku Kurd nepejirînin û tu car bi riyeke din razî nebin.

www.arsivakurd.org

HIQÛQ Û DADMENDÎ

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Tekûzkirin û edilandina rêbazên civakî yên ku bi egera ahengdariya civakê tên amadekirin, wekî dadê tên binavkirin. Pêwendiyên mirovan ên civakî û astengkirina neheqî û binpêkirina mafê mirov û parastina mafên mirov yên rewa bi saya dadê(hiqûqê) têne misogerkirin.

Her çend ku wateya peyvê ya ferhengî were dayîn jî, ev kirû ji hêla têginî ve gelek wateyên din ên kûr û berfireh di xwe de dihundirîne. Heke ku li welatekî hiqûq hatibe binpêkirin û mafên mirov yên rewa hatibin mandelekirin, tu kes nikare li wî welatî behsa jiyaneke azad û aramiya civakê bike. Lewre civak tenê ji xilbeya mirovan pêk nayê. Gelek tiştên din ên ku civakê dikin civak û çêj û tehmê didin jiyana wî/wê ya rojane, hene. Bo nimûne xwarin, vexwarin, vehesîn, aştî, aramî, azadî, ahengî, mal, milk, derdor, pêwendî, danûstendin... û hwd.

Li cih û deverên ku binpêkirina mafê mirovan xurt, belê hukmê dadmendiyê qels be, hejmara mezringeyên azadîxwaz û demokratîk jî (ên mîna rêxistin, sendîka, partî, komel, sazî û dezgeyên ku bi hinceta pêkanîna dadmediyê tevdigerin) jî ew qas zêde ye. Lewre ew sazî û mezringeyên ku bi mebest û egera parastina mafê mirovan tên avakirin, hêz û qinyateke mezin didin civakê û bandoreke erênî dihêlin. Ji bo wê, divê hiqûq û dadmendî ne ji bo parastina zilm û zordariya kes û hêzên serdest; berevajî wê, divê ji bo kesên bindest û mafê wan ên rewa were bikaranîn.

Dadmendî bastûra aramî û ahengdariya civakê ye. Heta ku li ser rûyê dinê maf û dadmendî neyên parastin, tu heyîn û heyberên jîndar yên vê dinê nikarin hebûna xwe bidomînin. Carekê, parsenga ahengdariya dinê, girêdayî pêwendiyên mirov ên bi xwezayê re dirb û dirûv digire. Yanê gava ku hiqûq û dadmendiya dinê xerab dibe, aheng û guncaniya ser rûyê dinê jî serobin dibe.

Hiqûq, li gorî rêbazên hiqûqnasiyê , wekî du cureyên bingehîn tê hesibandin:

1. Hiqûqa arizî
2. Hiqûqa giştî

Hiqûqa arizî: Wekî hiqûqa ku bi mebesta parastina pêdivî û berjewendiyên mirov, tê bikaranîn, tê binavkirin. Bo nimûne; hiqûqa bezirganiyê, hiqûqa şaristaniyê, hiqûqa ramanê, hiqûqa baweriyê… û hwd. Li gorî vê hiqûqê, pêdivî û berjewendiyên mirov, ji bo her kesî heman tişt e. Belê di rastî û karvaniya jiyanê de, hin pêdivî ji bo hin kesan tenê wekî daxwaz û ji bo hin kesan jî wekî diviyatî têne pejirandin. Ev jî tê wê wateyê ku mirovahî ji hiqûq ji dadmendiyê bi dûr



ketiye û û mirov wekî alaveke neheqiyê tê bikaranîn.

Hiqûqa giştî: Wekî hiqûqa bi mebesta parastina berjewendiyên mirovan ên hevpar(ên civakê) tê bikaranîn, tê binavkirin. Bo nimûne; Hiqûqa bingehîn, hiqûqa cezayê, hiqûqa kar û xebatê, hiqûqa aboriyê, hiqûqa rêveberiyê, hiqûqa darizandinê… û hwd. Li gorê vê hiqûqê, xizmet û suxrevaniya civakê li ser pişta dûgela(dewleta) wî wlelatî ye.Û divê bi destê wê pêk bê.

Mixabin, hiqûq û dadmendiya dinê jî îro dişibe pergal û rêveberiya wê ya sitemkar. Kes û hêzên ku navê hiqûqê ji ser zar û zimanê wan nakeve û nemaze jî mafê mirovan û wekî benîştekî pûç di hundirê devê xwe de dibin û tînin, radibin singê neheqiyê dikutin û tûrê bêmafî û bêbaviyê pê dardedikin. Bila ne behsa maf û hiqûqê bikin û ne jî neheqiyê belav bikin. Ma ku hiqûq hebe, ew qas êrîşkirin, dagîrkirin, parvekirin û dardekirin ji bo çi ye? Ma ku dadmendî hebe, ev qas şer û pevçûn, girtin, kuştin û darizandin ji bo çi ye? Heke maf û mafdarî hebe, ew qas birçîtî, tazîtî, xizanî û nezanî ji bo çi ye? Heke rastî û duristî hebe, ew qas rûtî û durûtî ji bo çi ye?

Bêguman, maf û azadî qet nayê wateya bêsînoriyê. Azadî, ne ew tiştê ku mirov di dil û mêjiyê xwe de disêwirîne û li gorî dil û daxwaza xwe pêk tîne ye. Azadî, ew mafê mirov ê rewa ku bi mafê mirovekî/e din re hatiye sînordarkirin e. Yanê li gorî vê raveyê, tu kes nikare sînorê mafê xwe der bas bike û mafê mirovekî/e din dagîr û binpê bike. Belê dinya û mirov bi xwe jî şahidê vê yekê ye ku, kî xwediyê hêz û serdestiyê be, mixabin ew heman gavê dibe xwediyê maf û azadiyê jî. Dibe ku ew xwe serwer û azad bihesibînin; belê tu car ne dadmend û mafdar in. Û ew bi navê serweriyê, hiqûq û dadmendiyê binpê dikin. Ew li gorî kêfa dilê xwe tevdigerin. Wekî ku William Pitt dibêje: “ Li cihê ku hiqûq diqede, kêf û daxwaz dest pê dike.”

Em ê vegotina xwe bi gotina Gandî (yê gorbihûşt) bi dawî bikin: “Pergala neheqiyê, bi dadmendiyê tê hilweşandin.”

Kaniya Helbestan

ÛMIR QEDİYA

Letîf Epozdemir

Tenêbûn halê Xuda ye
Çima naçî tu dîwana cimetê
Bêkesî derdê sala ye
Daxil bibe kûraniya sihbetê

Piştevan be ji dozê re
Li bejnê ke tu kirasê rûmetê
Her dem rast be ji yarê re
Bibe guhdarê qise û şîretê
Evîn qediya, koçebar bû
Me ji destan pir kişandî
zehmetê
Yar xeyidî ji me dûr çû
Ne bû nesîb ku em bikin
dawetê
Êdî kal in dipên roja
Şiyarnebûn em ji xewna
xefletê
Ne man em dûr ji qewl û
bela
Me venexwar ji şerab û
şerbetê
Emrê dinê zû derbaz bû
Me jê ne dît serfiraza lezzetê
Heta duhî sergerdan bûn
Îro ketin dû fêkiyê cenetê.

BÊJE ZALİM

**Bêje zalim tu niyetê
Evîna dil ji bo kî tê
Ku ne ez bim li vê dinê
Kî ji ter dike qametê.
Wer bi tîra min nekuj e
Navêje ber piyê neyar
Va çand sal e sedem tu
yî
Ku dilê min maye beyar.**

**Were rayê êdî bese
Ezê bi te bikim îman
Ji bona birîna hinav
Bibe tu merhem û
derman.
De rûneyne li ber camê
Pora guzvan ne de bayê
Li jorê be li eywanê
Dilê hesûd pê êşayê.**

**Ax rebiyo çiye me sûç
Çima ewqas cewr û cefa
Ma nabînim tenê rojek
Dilek hêsa kef û sefa.**

www.arsivakurd.org

Çeprast:
1. Welateke herî biçûk yê cîhanê.
2. Damezirînerê hikûmeta Mad.
3. Yek ji notên muzîkê – Helbesvanekî navdar yê Kurd.
4. Evro – êş.
5. Paranewe bi Kurmancî – Welatê herî dirêj yê Cîhanê.
6. Berevajiya wê dibe yek ji Bajarên bakûra Îranê – Dibêje bi Soranî.
7. Pêş nine – Yek ji astarên dora topa erdê.
8. Ev bi Îngîlîzî ku ji bo nîşandan tişt û alevan tê bi kar anîn – Helbestvanê navdar yê Kurdistana Bakûr – Ev bi Farsî.
9. Nivîskarekî bi nav û deng yê Feransî.
10. Peyvekî Îngîlîzî ye ku hekî P bihê zêdekirin, dibe dijberî.

Serjêr:
1. Welatek di Asiya Rojava de.
2. Rêze çiyayek di Kurdistana Bakûr de.
3. War bi Turkî – Berevajiyê wê dibe navê çiyayekê di Sine de – Kurtiya Peyva kîderê ye.
4. Germahiya Agir – Di Îngîlîzî de tê wateya lêkera E – Roj bi Soranî.
5. Hekî Ç bihê zêdekirin tê wateya bizmarên erdê – Yek ji alavên mixenîkan.
6. Ne cahêl e – Hekî bihê berevajî kirin, tê wateya aqil nine.
7. Hekî H bihê zêdekirin, dibe lîstikeke li ser cemedê – Hekî bihê berevajî kirin, tê weteya jan – Duhî nine.
8. Ne bi Îngilîzî – Heywanekî çolê ye.
9. Welatekî Afrîqî ye.
10. Çêkerê alava Tenk.

Xaçepirs

Amadekar: Meryem

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1	■								■	■
2	■	■	(1)		(3)				■	
3			■					■		
4		(5)		■	■	■	■			
5					■	■		(2)		
6					■	■				
7				■	■	■	■			
8			■		(4)			■		
9		■							■	■
10	■	■								■

Peyva veşartî: ( )1 ( )2 ( )3 ( )4 ( )5

Besiva Xaçepirsa hejmara 37'an

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1	A	M	E	D	■	■	S	E	L	A
2	R	O	J	■	D	M	■	Q	A	Ş
3	W (3)	Î	D	A	■	■	T	A	B	Û
4	Î	N	A	■	L	Ê	■	D (5)	A	X
5	N (1)	Î	■	S	A	M	Î (4)	■	R	I
6	G	■	S	I	M	O	R	E (2)	■	N
7	■	P	U	R	■	■	A	L	O	■
8	T	■	G	U	M	A	T	A	■	E
9	A	L	A	Ş	■	■	A	L	A	M
10	M	O	L	■	P	Û	■	E	V	R

Peyva veşartî: (N)1 (E)2 (W)3 (Î)4 (D)5

Bersiva Sudoku a hejmara 37'an

8	1	9	7	3	5	2	4	6
4	7	3	2	8	6	5	9	1
5	2	6	1	9	4	7	3	8
2	8	1	5	6	9	3	7	4
3	9	4	8	7	1	6	2	5
7	6	5	3	4	2	8	1	9
6	4	2	9	5	3	1	8	7
9	3	7	6	1	8	4	5	2
1	5	8	4	2	7	9	6	3

Sudoku

			3	6				2
3		8		2				
1						9		
		4	6					7
	9	6				1	2	
8					5	3		
		7						3
				3		7		9
6				9	2			

Xwendevanên hêja!
Ji bo serrast kirina "Sudoku" wan xalên jêrîn li berçav bigirin

1. Hejmarên 1-9'ê di rêza serjêr de dubare nabin.
2. Hejmarên 1-9'ê di rêza çeprast de dubare nabin.
3. Hejmarên 1-9'ê di nava stûneke 3×3 de dubare nabin.

www.arsivakurdi.org

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php

Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE
E - Mail:
rojnama_agiri@yahoo.com
agiri2003@hotmail.com

Di Erdheja sala 2003'an ya bajarê Bemê de Kela dîrokî ya wî bajarî herifî

Îran 11'emîn Welatê Pir Bûyer Di Cîhanê De Ye

Îran 11'mîn welatê pir bûyer yê cîhanê hate nasîn

Li gor rapora saziya Ticareta cîhanî, Îran bi 235 bûyerên siroştî û nesiroştî di midehê 3 dehsalên borî de wekî 11'mîn welatê pir bûyer yê cîhanê hate nasîn. Rapor dide eyanê ku qasê bûyerên xwezayî û ne siroştî di astê cîhanê de herweha ber bi zêde bûnê diçe. Di halekê de ku ziyan û zirarên çavkanî girtî ji wan qewmînane di dehsala 1960'an de ku her sal 8/8 Milyard dolar e, ev hejmare li dehsala borî de her sal 57/5 milyard dolar zêde kiriye. Li gorî raporê, sala 2005'an xirabtirîn sal ji bo qewmîna bûyerên siroştî û ne siroştî bûye ku di encama wê de 83 Milyard dolar zirar gihîştiye aboriya cîhanê.

Di rapora hatî de sercem bûyerên siroştî û nesiroştî yên qewimî di 170 welatên cîhanê de ji sala 1962 hetanî 2004'an xistiye ber Lêkolînan. Ku li gor vê Îran di refa 11'an de cih girtiye û ji 235 bûyerên cur be cur di Îranê de 140 bûyer siroştî û 95 jî nesiroştî bûne. Çîn, Hind, Amerîka, Fîlîpîn, Endoniziya, Bengiladiş,Birazîlya, Mekzîk, Nîciriya û Pakistan bi rêz li pêş Îranê de cih girtine. Piştî Îranê jî Japon bi 218 bûyeran ku 168 ji wan siroştî û 48 jî nesiroştî bûne di rêza dazdan de ye.

Jêder: "iran-chabar.de"

Berhemeke Nû

Berga Duyem Ya Rêze Berhemên Dr. Qasimlo Derket



"Tavgey Heqîqet" (Sûlava Heqîqetê), navê pirtûkeke rêzokî ye ku beşek ji berhemên bihagiran yên şehîdê nemir Dr. Ebdulrehman Qasimlo di nava rûpelên xwe de cih kirine. Berga nû û duyem di 320 rûpelan de hatiye amade kirin û di çend rojên çûyî hate çap û belav kirin.

Berga duyem ya pirtûkê di 5 feslan de hatiye berhev kirin. Berga duyem ya "Tavgey Heqîqet" bi destpêkekê ku ji aliyê birêz Kawe Behramî hatiye nivîsandin, dest pê dike. Fesla yekem, hevpeyvînên rojnameyî û çapemeniyên cuda cuda ên Dr. Qasimlo pêk tîne. Fesla duyem hevpeyvînên Radyoyî li xwe digre. Fesla sêyem jî Kongireya Pêncem ya PDK Îranê û xebat û têkoşînên têkildar yên wê ne. Fesla çarem Mîtînga mezin ya Mehabadê ye. Fesla pêncem ya berga duyem jî gotareke Dr. Qasimlo li ser fîlmê ye. Li gor gotina berhevkarê pirtûkê, birêz Kawe Behramî ev pirtûka rêzokî di çar bergan de tê pêşkêş kirin.

Desteya Nivîskar ya Agirî bona derketina berga duyem ya "Tavgey Heqîqet"ê sipas û destxweşiyê dibêje kekê Kawe Behramî û li kar û xebatê ji wî re hêviya serkevtinê dixwaze.

Wezareta Karê Derve ya Amerîka:
"Îran çalaktirîn welatê piştevanê Terorîzmê"

Wezareta Derve ya Amerîkayê rapora salane ya xwe li ser rewşa terorîzmê di cîhanê de weşand û tê de **Sipaha Pasdaran** û **Dezgeha Ewlekarî** ya Îranê bi piştevaniya rasterast ji terorîzmê û kiryarên terorîstî tawanbar kir.

Rapora han dide eyanê ku Sipaha Pasdaran di cehda tevlihev û alozkirina rewşa Îraqê ji rêya alîkariyên malî bi hêzên terorîstî û neraziyên Îraqî ye. Her wiha îşare bi piştevaniya Îran ji **Girûpên Felestînî** û **Hizbulaha Lobnanê** û haydana wan bo encamdana kiryarên terorîstî, dike.

Rapor îşare bi hebûna berpirs û endamên payebilind yên El Qaîdeyê di Îraqê de dike û dibêje ku Îranê karîna çêkirina çekên Biyolojîk û Kîmyayî heye û nigeraniya xwe li ser egera alîkariya

Îranê bi girûpên terorîstî di bidestxistina wan çekane de daye zanîn.

Her wiha rapor hejmara kiryarên terorîstî ji 3142 nimûnên di sala 2004' an de, bi 11 hezar nimûne di sala 2005'an de îşarê dike û welatên weke Kûba, Lîbiya, Sûdan, Sûriya û Koreya Bakûr jî bi welatên piştevanê terorîzmê dide nasandin.

www.arsivakurd.org